

**PÊRIST**

Pêşgotin .....	2
----------------	---

**Gotar û Lêkolîn**

Ezdîtî û Melekê Tawûs..... Dr: Rozad Elî	3
Roj jimêr ..... Mehfûzê Mele Silêman	7
Di şêstsaliya Ey Reqîb de ..... Mistefa Henan	13
Hevpeyvîn: Digel Salh Bozan ----- pirs	15

**Wêje**

Muruvet Cacim	23
Ger hêv M.Bekir	26
Mirovê nemir ..... Memê Alan	27

**Çêrok**

Hêvî û viyan ..... Merwan Berekat	32
Qaziya heqnas ..... Rezoyê Osê	36

**Helbest**

Cenga zeriyê ..... Mehmod Sebrî	41
Serpêhatiey ..... M.Qere Hesen	44
Zimanê kurdî li cîhanê	45
Du bêje ..... M.A. A	46
Bersiv ji pirsê re ..... Zamdarê zindî	47

-Hejmar - 42 - Havîn - 2008 .

- [www.kovarapirs@yahoo.com](mailto:www.kovarapirs@yahoo.com). -- Buha 50 L.S

## **Guhertina çep**

*Lî van salêن dawîn, guhertineke çep di warê nivîskariya bi zimanê Kurdî de, li ba hin nivîskarêن Kurd li Sûryê, rûdide.*

*Hin nivîsakrêن rêzdar, ku berî bi Kurdî dinivîsandin û berhemên xwe (gotar, kovar...) pê diweşandin, dev ji zimanê Kurdî berdidin û berê xwe didin zimanê Erebî.*

*Bêguman, ev guhertina ku li ba hin nivîskarêن zimanê Kurdî dibe, valahiya mezin a ku berê di warê nivîsandina bi zimanê Kurdî de heye, ferehtir dike, û me xwast nexwast, ziyaneka îjdil di warê netewtiya Kurdî de jî peyda dike.*

*Gava ku mera helwesta wan nivîskaran dide rûyê wan, ew bersiva ku herdem tê gotin dubare dibe: ((Kek... Xwendevanêن Kurdî tinene... Erebî jî ji me re dewlemn'tir e û ji xwendevanan re jî hêsanter e...)).*

*Bêguman, ta radekê ew herdu rastî rast in, lê li ber roniya wê bersivê, ev pirs jî hene: Ew nivîskarê ku zimanê xwe berdide û xwe li ber zimanê Erebî germ dike, ta kîjan radeyê dê di Erebî de bi serkeve?. Ta kîjan qonaqê dê kanibe di pêgeha (zehma) bilind a ku di warê medya û wêjeya Erebî de heye cihê bigre?. Çend alavên ragihandinê yên Erebî dê amade bin, nivîsên wî nivîskarî biweşînin? Yan jî ewê dîsa berê xwe bide medya Kurdî û berhemên xwe yên bi zimanê Erebî tê biweşînin?*

*Eger nivîskarekî Kurd kanibe derbas nav medya Erebî be, wê hîngê mijarêن wî çi bin jî, mera dê bêje biravo û sipas jêre. Lê eger rê ji xwe re venekir û tê de biser neket, wê hîngê ew dibe wek ewê ((genimê xwe bi cehê xelkê dayî)).*

*Bi rastî meletê me bi gerekî rewşenbîrêن xwe ye, zimanê me li benda her nivîskarekî Kurd e. Digel hemî mercan, hîn zimanê me zindî, jindar û pêdar e, lê mixabin xuyaye em jêre û ji şîrê diya xwe re ne dilsoz in. Digel xemsariya beloq a rewşenbîrêن me, û li gor hin vepirsînan, dîsa jî zimanê Kurdî di nav bi sedan zimanêن ku li cihanê têن xebtandin, ji hêla bandora xwe, de di pileya 31an de cî digre. Ev yek dupat dike, ku kesên bi zimanê Kurdî dinivisîn hîç ne poşmanin û ne jî kembext in! Ew di riya rast de ne, tenê yên rêzdariya zimanê gelê xwe naparêzin wan riya çep û çewt vebjartiye.*

*desteya pirsê*

## Êzdîtî û Melek Tawûs

Dr: Rozad Elî

Êzdî oleke kevin e li Rojhila Navîn. Ew tenê di nav Kurdan de tê dîtin. Ji ber wê jî, ew beşeke resen e ji çand û dîroka gelê Kurd e.

Ji hêla ramanî û olbaweriyan de, gotin û nêrînên têvel li derbarî ola Êzdî têن kirin. Hin ji wan rastiyê diyar dikan, hin jî dûrî rastiyê diçin.

Yek ji wan gotinan, Êzdiyan bi perestvaniya “Pêriyê Xinanî û şerxwaziyê(Iblîs) dide nasîn, ew yek jî li gor têgihîştina Îslamî ji pirsa Iblîs re, sergêjiyeke civakî ya berbiçav ji bawermendê ola Êzdî re peyda dike.


Ji ber wê jî, dê sûdar be, eger dîrok û baweriyanê Êzdîtiyê werin lêkolîn, naskirin û şirovekirin.

Gelao.. Kanî zanînên ola Êzdî li derbarî mijara Pêriyê şerxwaziyê ci dibêjin?

Di jêderên Êzdîtiyê yên olî de hatiye, ku li destpêkê, Xwedêyê gewre ji roniya xwe ya giranbuha heft Pêriyên mezin afrandin, ew jî ev in: Izraîl, Ezazîl, Dirdaîl, Israfil, Mîkaîl, Şimqaîl û Cibraîl, û ji wan Pêriyan komelgeha Pêriyane ya giyanewerî ya destpêkê damezrand, û ew her heft pêrî li dora textê wî yê zorgewre gerîn.

Piştî ku Xwedê gerdûn û zemîn jî çê kirin, û ji her rengekî jiyan bi nav de berda, ew her heft Pêrî ji xwe re kirin alîkar û birêvebirina karûbarêن gerdûnê û hemî afrandeyan bi wan hilpesartin, û ew ferman jî kirin, ku ji wî tenê re perestvaniyê û secdê bikin.

Pişt re Xwedê govdê Adem jî afirand û giyan pê de berda, û ferman da wan pêriyên xwe daku ji Adem re herin secdê. Wê



hîngê hemî pêriyan secde kirin, tenê Ezazîl neçû secdê!! Wê hîngê Xwedê jê pirsî, tu çima secde nakî? Ezazîl li Xwedê yê xwe vegerand û got: Xwedêyê min, te em ji surra xwe ya 'ezîz afirandine û te Adem jî ji şenberên zemînê çê kiriye, û dema te em afirandin, te em agahdar kirin, ku ji bilî te, em ji ti kesî re bejna xwe naşkînin û perestvaniyê nekin, ez jî Xwedeyekî ji bilî te nas nakim û sozê xwe jî bi te re naxim, û lewre jî min secde nekir.

Wê hîngê, Xwedê gewre ji Ezazîl re got: Birastî tu pêriyekî guhdarî û dilsozî, te şireta min ji bîr nekiriye. Wê çaxê Xwedê rabû tokeke zêrîn xist stuyê wî û ew kir serokê Pêriyan, û ji wê hîngê de ew bi “Tewûsê Pêriyan/Tawûsê Melek” hat binavkirin.

Ji vê hewaldana Êzdiyetiyê tê têgihîştin, ku dema Ezazîl ji Adem re secde nekir, Xwedê ew sezâ seza nekir, li bervajî wê, ew ji ber dilsozî û pêgirtina wî bi şireta Xwedê re, hat pesinand? û Xwedê ew ji xwe ve nêzîktir kir.

Di vê babetê de jî, gotina Îslamê baş naskirî ye, ew dibêje: ku gava Melek Iblîs (Ezazîl) fermaña Xwedêwî bicih nanî, Xwedê ew ji komelgeha Pêrîtiyê û ji paytexta xwe ya Xwedêwî avêt, lê sezakirina wî hîşt roja qiyametê, ew ji wê demê ve bi navê “Pêriyê Şerxazî û Xinaniyê (Iblîs)” hat salixdan.

Ev cudatiya li derbarî Pêrî Ezazîl ku di navbera gotinê herdu olan de heye, yek ji xalêr herî bigirêk û peykêş e li ba bawermendêñ hemî olêr ezmanî, û ji berê de, rê li ber guftûgoyêñ ramanî û olbawerî vekiriye.

Di vê karnavê de, bawerî heye, ku damezrawê ola Êzdî Şêxadî jî, yek ji ewêñ ku di vê pirsê de xudî nêrîneke cûda bû, û wî nêrîna mayîna Melek Ezazîl wek serokê Pêriyan vebjartiye.

Tê bawer kirin, ku Şêxadî nêrîna ji ramana sade ve nêzîk bû, û ji salixêñ rastgo û dilsoz ku Xwedê tevahiya gerdûnê û endamêñ wê li gor wan afirandibûn, vebjartiye, bawer nekiriye ku Ezazîl ji paytexta Xwedê hatiye qewtandin.

Ew helwesta Şêxadî li bingehêن felsefî yên ku Xwedê afrandeyên xwe li gor wan afrandine jî tê, wek payebilindiya Xwedê û yektayîya wî, û ew bê heval û hevpar e (çî teşeyên ezmanî û çî yên zemînî), û cihê lave û bergera her afrandekî û her perestvaniyekê ye.

Lê belê Adem, afrendeyekî Xwedê ye û koleyekî wî ye, loma jî gengazî nîne ku ew şûna Xwedê bigire û û were perestkirin û secde jî jêre bibe. Ango, perestvanî û secde di navbera afrandeyan bixwebixwe de nabe, ew tenê ji Xwedêyê afranvan re tê kirin. Eger radeya afrandeyekî di binyata sîstema Xwedêwî yan cîhanî de çî be, û delametên wî yên ezmanî û zemînî jî çî bin, perestvaniya afrandeyan jihev re mîna gawirtî û înkarkirina yekîtiya Xwedê tê jimartin.

Helwesta Êzdîtiyê li derbarî Ezazîl bi vê nêrîna jorîn tê şirovekirin. Ango Êzdîtî nabêje Ezazîl gunehkar e, û ne jî ji paytexta Xwedê hatiye qewtandin, li bervajî wê, di Êzdîtiyê de, Xwedê dilsoziya melekê xwe Ezazîl bilind nirxandiye û ew kiriye serokê Pêriyan.

Wê lomê jî, Ezazîl “Tawûs Melek” di ola Êzdî de bi sinc û delameta xwe, ne “Pêriyê Xinaniyê” ye. Eger salixên Tawûs Melekê Êzdî, di besê pêşîn de mîna salixên Ezazîl in di ola Îslamî de, lê ew di besê diduyan de li ba Êzdiyan, Fîriştewyekî xêrxaz, dilsoz û ji Xwedêyê xwe re guhdar e û ticarî xinaniyê nake û nabe şerxwaz. Ango:

Digel ku Tawûs Melekê Êzdî û “Pêriyê Xinaniyê-Iblîs” di besê yekê de ji çêroka olî, di herdu olên Êzdî û Îslamî de mîna hev in, lê ew di besê diduyan de, ji hêla salix û delametên xwe ve ne yek in û ji hev cuda ne. Di besê diduyê de, Tawûsê Melekê Êzdî ji sîstema netê avêtin, û bi Xwedêyê xwe re wek Pêriyekî dilsoz dimîne û bi kardayînên ku Xwedê pê hatine hildipesartin radibe.

Ji bilî wê, teşeyekî giyanewerî li mûdêla teşeyên şerxazane û ji Xwedê re ne agahdar, wek Engra Mayno yê Zeredeşti û Iblîsê olên ezmanî, di sîstema Xwedêwî ya Êzdîtiyê de tineye. Ramana Êzdîtyê li ser vê mijarê dibêje: ku: Her karek di gerdûnê de, çî

çê û ci neçê, bi fermana Xwedê tê kirin, û tikes ji bilî wî rê nade  
û nikane bike.

Qewl dibêje:

**Amîn Amîn Amîn  
Tebarek Ellahû idîn  
Ellahû ehsenûl xaliqîn  
Xêra bide şera wergerîn**

Yanê çêxazî û şerxazî yekser bi vîna Xwedê ve girîdayî ye, rewşike ezmanî Xwedêwî ye cêwî (xêr û şer), bi şêweyekî eşkere di ola Êzdî de xuyan nabe. Anglo di Êzdîtiyê de, pêdvî bi hebûna teşeyekî ezmanî ku şerxwazî û çepeliyê di afrandeyên Xwedê de biçîne û eşkere dijberiya vîna Xwedê bike, û ta roja qiyametê bimîne, netê ferqkirin.

Em bawer dikan, ku ev tişt, gotina perestevaniya Êzdiyan ji Firîşteyê Xinaniyê re bicarekê ji holê radike.

Belkî yek bipirse? lê çîma Êzdî ji hildana navê Iblîs/\$, dixeydin û hildana wî navî gunehkar dikan?

Di baweriya me de, sedem zelal e, çinkî cudatiya di navbera kesayetî û delameta herdu Pêriyên Xwedê Tawûs Melek û Iblîs, di herdu olên Îslam û Êzdî de, bi zelalî ne hatine naskirin û şirovekirin. Loma jî gava ku salix û delameta Iblis bi Tawûs Melek dikevin, ew di Êzdîtiyê de, wek bêbextiyekê tê dîtin, û rêzdariya Tawûs Melek tê gêrkirin, ew jî di Êdîtiyê de wek gunehkarî tê jimartin.

\*\*\*\*\*

# ROJ JIMÊR Û NAVÊ MEHAN

## LI NIK KURDAN

Mehfûzê Mele Silêman

### Destpêk :

Di van deh salên dawî de, gelek rojname (roj jimar) bi zimanê kurdî derdikevin, derhênerên wan bê rê û binyat navan li mehan û rojan dikin, hin ji wan navan bê wate ne û tu kes nizane ka ji kû anîne?! , û pir ji wan jî bê resen in ( bê kok in ) û bixwe ji zimanê biyan hatine girtin, û bi şaşî û çewtî di nav kurdan de bi kar hatine .

di baweriya min de, tegereke mezin e, û babetekî pir pêwîst e ku mirov li ber raweste , û perda tariyê û gelcê ji ser hilîne, bi hêvî me ku ev bizava min gavek dirust be di rêya parastin û pêşxistina zimanê kurdî de.

### **Roj jimar :**

Ji mêj de mirovan di warê çandiniyê de, beramberî tevgera stêran û gera roj û hêvê li azmên û li gorî çerxandina (zîvirandin) goya

zemînê li dora xwe, kar dikirin.

Wan dem beş dikirin, û vederî rewşêن keşê ( av û bayê ) û nîrêن jîyanê yên cuda ( û bê ser û ber ) nav li parçê salê di kirin , çi demsal, çi meh , çi hefte û çi roj.

### **Gongirêن çerxîn**

#### **( burcêن asîmanan ) :**

Miletêن kevnar yên di navbera herdû çeman de ango Dîcel û Ferat (welatê Mîzopotamya) û Misriyan, gongirêن çerxîn nas dikirin, lê Yûnaniyan ji wan bêtir dizanîn, çimkî wan goya çerxînê bi çixîzan (xêzan) dabeş dikirin, û çixîza destpêkê ( sifir) ango xala pêşîn ji 21ê Avdarê dest pê dikir, ango navcîtiya biharî (wekhevbûna roj û şevê), di nîvê bakur de ji goya zemînê stêrik didîtin, ku çawa di

demeke nîşankirî de diyar dibin, ewêñ ku piştî salekê li ciyê xwe vedigerin.

Li hember vê jî, çixîza (rêça gera) gongiran dabeşî (12) diwazdeh burcan kîrin, û li gorî çesin û wêneyêñ wan wekî ku xuyanî dikirin nav li wan dikirin :

1- Berx. 2- Ga. 3- Cêwî (duwane). 4- Xirçeng (penceşêr). 5- Şêr. 6- Keçîndar (qîzik) yan simbil (hoşe). 7- Terazî (şehîn). 8- Dûpişk (dolpî). 9- Kevan. 10- Karik yan (berx). 11- Avdank (avrêj). 12- Neheng (dumasî).

### Sala heyvîn :

Di rojgerên kevin de, wek di TEWRAT û QURANê de hatîye, mirovan ro'jimara mangan li gorî cîwaziya cureyêñ (çeşnêñ) heyvê, ji hilat û ta çûnava bikar tanîn. Lewre sala heyvîn li diwazdeh mehan dabeş kirin, û her mehek bi bîst û neh rojan û diwazdeh katan hejmartin.

lê gava karê çandinîyê kirin, dîtin ku ro'jimara heyvîn nediruste, ji bo çaxê

çandinê û çinînê û bi kîr nayê, çimkî gera mehêñ heyvîn li hember demsalêñ xuristê ne yekser û ne sazker in.

Ji bo vê yekê, divabû sala heyvîn yekser bikin, ta ku vegere destpêka xwe ya rast, ev yekser bûn jî karekî homos û ne bijartî bû li cem oldar û zanyaran.

{ Impaz (beyt): Meha REMEZANê ango (germa dijwar) di hemî demsalan re dibûre, wiha jî bê wate dibe, nemaze ku REMEZAN dikeve zivistanê}.

### Sala rojîn :

Ji ber sala rojîn sêsed û şêst û pênc roj û şeş kat e, demsal jî tim di çaxê xwe yên xurist de têñ, ji bo wilo jî mirovan berê sala rojîn li şûna sala heyvîn bi kar hênan.

Misriyên kevnar, yên pêşîn bûn ku sala rojîn bi kar hênan, û ji 19ê nozdehê gelawêja sala 4241berî zayînê dest pêkirin, li wê rojê stêra gelewêjê di çaxê hilata rojê de derdikeve.

Pişt re, YOLYOS QEYSER bi alîkariya stêrnasê bi nav û deng SOCÎN ro'jimêra rojîn di sala cil û şesan berî zayînê de bi ro'jimara yolyosî bi navkir, û meha Reşmehê (sibatê) kire bîst û heşt roj û bîst û neh roj piştî her çar salan. Û mileten rojhilatê yên kevnar jî, ji berî duhezar û sêsed û pêncî salî berî zayînê sala rojîn bikar tanîn .

### **Destpêka ro'jimêran:**

Şaristaniyên gelên kevnar, serpêhatiyên diyar di jiyana xwe de, bi destpêka ro'jimara xwe re nîşan dikirin, û gelek gelan bi navê şah û serokên xwe yên mezin û navdar salên xwe bi nav dikirin, da ku ew neyên ji bîrkirin, û di dîroka gelên xwe de nemirin.

Li jêr emê hinek seretayên ro'jimêran binivîsin, da bêne nas kirin:

\* Ro'jimêra Zayînî (2008 z.): Yekê çile roja zayîna ÎSA (ev e ro'jimara ku hemî gelên cîhanê di jîyana xwe de bi kar tînin.

\* Ro'jimêra Mişextîn (1428-1429)M : Roja

hînê(înê) 16ê gelawêjê sala 622 z. roja ku pêxember Mihemed ji Mekê mişext bûye.

\* Ro'jimêra Quptî (1724) Q : Roja hînê 28 ê Nîsanê sala 284 z. roja ku DIQLIDYANOS gelek xaçparêz kuştin .

\* Ro'jimêra Silûqî (1075)S: Roja yekê nîsanê sala 933 z. ew jî ji dîroka İSKENDERê du qiloç ve ye .

\* Ro'jimêra Romî (rojhilatî = xaçparêzî = kurmancî = suryanî), (1423-1424) R: Roja 14ê avdarê sala 584 z. ew jî bi 13 sêzdeh rojan piştî ro'jimêra zayînî ye .

\* Ro'jimêra kurdî ( 2620) k: Ji 21ê avdarê sala 612 z. dest pê dike , roja ku MÎDIYAN zora AŞÛRIYAN birin , û ketin peytexa wan bajarê NÎNEWE.

Hinek ji kurdan ro'jimara kurdî ji dema ku dewleta MÎDIYA hatîye damezrandin de dijmêrin, ango roja 21ê avdarê sala 700 B.Z. û lihember sala MEDî dibe 2708 ME. .( Me: ro'jimara Medî ) .

Sirinc/Têbîn : Her miletekî li cîhanê dîroka wî

heye, û destpêka ro'jimêra wî jêre taybet e.

### **Navên mehan:**

**a-** Pêşîyan mehêن salê bi hejmaran nas dikirin, û binav dikirin , mîna ROMANIYAN ji meha heftan re digotin Siptember, û ji ya heştan re digotin November, û EBRANÎYAN wekî ku di tewratê de hatî ye???.

**b-** Pişt re ROMANIYAN navê QEYSERÊN xwe li mehan dikirin , wekî OXOSTUS li tîrmehê kirin, û YOLYO li gelawêjê kirin.

**c-** hinek ji miletan bi yezdanan bi nav kirin , wekî yezdan TEMÛZ li meha gelawêjê kirin ( TEMÛZ jî ji bal gelek gelên cîhanê yên kevnar naskirîye ).

**d-** Vederî rewşên keşê ( av û bayê) wekî REMEDAN ango germa dijwar, û CEMAD ango serma dijwar, misilmanan bi kar hênan .

**e-** Li gorî kar û barêن abûriyê û çandiniyê wek bêjin: Meha çandiniyê, meha avakirinê, meha çêkirina mêt, ... Li rex BABILÎYAN. Li gorî zerbûna pelê daran jî

dipayizî de, wiha jî gelên SILAVÎ ji Çirîya Pêşîn re digotin (zer), û ji Çirîya Paşîn re digotin (meha bê), yan jî (meha xwînê).

ENGLOSEKSONÎYAN jî, ji Rezberê re digotin (meha çinînê), wek li nik CIRMANIYAN û SIWÊSRIYAN .

Ev in çend nimûne ji ro'jimêrên gelên cîhanê yên naskirî û belav kirîne, û li vê demê di nav dewletan de bi kartêن:

### **- Navên mehêن Romanî :**

1- Yenayir	2- Yfibrayir
3- Mart = Mars	4- Epril
5-May = Mayo=Mayis	6-Yonyo
= Oxist	7- Yolyo 8- Oxistus
	= 9- Siptember 10- Oktober
	11- November 12- Dêseember

### **- Nave mehêن Rûmî:**

1- Tişriîn qedîm= Tişrîna Pêşî	2- Tişrîn Hiray= Tişrîna
--------------------------------	--------------------------

Paşî	3- Kanûn Qedîm= Kanûna Pêşî	4- Kanûn Hiray=
------	-----------------------------	-----------------

Kanûna Paşî	5- İşbat = Şibat	6- Ezar= Azar
	7- Nîsan	

8- Eyar = Newar 9-  
Hezêran 10- Temûz 11- Ab  
= Eb  
12- Eylûl .

Sirinc: Navê mehêن Rûmî ji mêj de ne, û bi zimanêن kevnar hatine binavkirin, wek SOMERÎ, ARAMÎ, SURYANÎ, AŞÛRÎ, BABILÎ, Ü BEHLEWÎ, ....

- **Navê mehêن Mişextî (Erebî) :**

1- محرم 2- صفر 3- ربيع الأول 4- ربيع الثاني (الآخر)  
5- جمادي الأولى 6- جمادي  
7- شعبان الآخرة 8- رجب  
9- رمضان 10- شوال  
11- ذو القعدة 12- ذو الحجة

Sirinc: Mehêن Rojîn ji meha pêşîn heya meha paşîn ji salê li pey hev hatine rêzkirin , ango meha Tişrîna Pêşî meha yekê ye di sere sala Rûmî de .

- **Navê mehan li nik Kurdan:**

Ji ber ku miletê kurd di nav pir herêman de bela wela ye, û bi gelek zaravan dipeyive, mehêن salê bi gelek hawan û rengan bi navbûne, li gorî rewşen li dar û li serpêhatîyên diyar di her mehekê de. Mehêن kurdî jî ev in :

1- Meha Yekê (yekem ) :  
Bihara Pêşîn= Avdar= Newroz= Axlêv= Axlêwe= Xake lipwe= Hermî Pişkiwan= Hirmî Pişkivan .

2- Meha didiwan (diwem ) :  
Bihara Navîn= Nîsan= Nûzan= Cotan= Gulan= Banemer= Şêstbaran .

3- Meha sisîyan (sêyem) :  
Bihara Paşîn = Gulan = Cozerdan

4- Meha çaran (çarem) :  
Havîna Pêşîn= Xîve= Xêwe= Coxînan= Bêderan .

5- Meha pêncan( pêncem):  
Havîna navîn= Tîrmeh= Pûşber= Mêwegenan = Serîseng = Gelawêj .

6- Meha şesan (şesem):  
Havîna Paşîn= Tebax= Lat= Porışber .

7-Meha heftan (heftem):  
Payîza pêşîn= Îlon= Îlûn= Kewçêrînk= rezber= Manga Topeme.

8- Meha heştan (heştem):  
Payîza Navîn= Xezilwer= Xezelor= Bawer= Çirîya Pêşîn= Çirîya Yekê= Gelarêzan= Gerêjan.

9- Meha nehan (nehem):  
Payîza Paşîn = Sermawez= Kewberdar= Çirîya Paşîn= Çirîya Didûwan= Sermavêj.

10 - Meha dehan (dehem): Çilê Pêşîn= Berçile= Befirbara Yekê.

11- Meha yazdehan (yazdehem): Çilê Navîn= Çile= Befirbara Didûwan= Rêbendan= Rêbenan= Seholbendan .

12- Meha diwazdehan (diwazdehem): Çilê Paşî= Reşme= Reşmeh= Gecko= Keçok= Bazeberan.

### Mebest ji gotarê (dawiya gotarê):

Ji bo ye'kirina navên mehan di ro'jmîrêne Kurdî yên nûjen de, bi hêvî me ku nivîskarêne Kurd û danerêne ro'jmîran, van navên jêrîn di nivîsandinêne xwe de pêk bînin, sedem û egerêne vê pêşniyarê jî ev in:

1- Bilêvkirina wan sivik û hesan e .

2- Ji ber ku pir ji wan di nav gelê Kurd e, û li gelek herêman ji welêt bikar hatine .

3- Navê wan bi Kurdiyeke dirust û paqij e, bi wate û binyat in, li gorî demê ku têre dibûrin e, ne biyanî ne, ji zimanêne biyan ne hatine girtin û ne bi koûrkî jî hatine binavkirin.

4- Çinkûu di gelek ferhengêne hêja, pirtûkêne kevnar û

govarêne bi nirx de hatine xebitandin.

### - Navê mehêne salê li nik Kurdan ev in:

1- Newroz (Avdar), meha pêşî ye ji salê. 2- Nîsan. 3- Gulân. 4- Xêve. 5- Gelawêj. 6- Tîrmeh. 7- Rezber. 8- Xezelor. 9- Sermavêj. 10- Bercile. 11- Çile. 12- Reşemeh.

**Têbîn ji kovar Pirs:** ((Erê gelek ji van navêne mehan li roja me bi kar têne, lê Kovara Pirs pistgiriya xebitandina wan navan li xwe negirtiye, ew tenê nêrîn û dîtina nivîskar belav dike))- sipas.

### Jêder û Hogan :

- 1 معرفة الأكراد - توماس بوا
- 2 أسماء الأشهر العربية - د. فريج بروج السماء - د. علي موسى
- 3 حساب التواريخ - د. الهبو الميلاديقو القبطيقو الهجرية
- 4 تقويمي الصباح والنصار
- 5 التقويم السرياني
- 6 Ro'jmîrê Kurdistan D.qeftan
- 7 القاموس الثلاثي - د. عفراوي
- 8 القاموس العصري - سيدو كوراني
- 9 قاموس مهاباد - موکریانی
- 10 Govara hawar - mîr celadet
- Mehfûzê mele silêman

— 06 - 04

## Di şêstsaliya goçbarkirina danerê

### “Ey Reqîb” de

Sirûda **Ey Reqîb**, sirûda netewî ya gelê rêzdarî û hurmetê jêre digre.

Sirûda **Ey Reqîb** ji danîna parêzer û helbestvanê nemir Yûnês Reûf e ku bi navê (Dildar) tê nasîn.

Dildar li 02-02-1918an de li başûrê Kurdistanê li bajarê Koye ku bi ser bajarê Hewlîrê ve dikeve, ji dayîk bûye. Xwandina xwe ya sereta û ya navendî li Raniye (hin jêder dibêjin li kerkûkê) kuta kiriye. Piştî wê, ew berê xwe dide Bexdayê ta ku xwandina xwe li kulîja yasayê (huqoq) li zanîngeha Bexdayê berdewam bike. Piştî bidawîkirina xwandinê û derçûna wî ji zanîngehê, çend salan karê parêzeriyê dike, lê ev kar ne li gor hêvî û armancên wî bû, çimkê meraqa wî bêtir li ser wêje û nivîsandina çêrok û helbestê bû, loma jî dest ji karê parêzeriyê berdide û berê xwe dide nivîsandina çêrokan û ristina helbestan.

Hesta wî û helbestên wî hemî li ser hesta netewîbûn.

Di helbestê  
n xwe  
dijminê  
gelê Kurd  
û zora  
wan li  
ser  
Kurdan



**Yûnês (Dildar)**

şermezar û rûreş dikir. Ji ber wê jî, pir êş dihatin serê wî.

Li sala(1938)an, rijîma Îranê Dildar digire û dixe zindanê, ew di zindanê de ew Sirûda hêja dinivsîne. Wî deqa helbestê bi zaravê Soranî nivîsandibû, û pişt re ew hat wergerandin zaraveyê Kurmancî û bi tîpêñ Latînî hat nivîsandin.

Ey Reqîb yekemîn car li sala 1946 an, di dema Komara Mahabadê de bû sirûd û merşa netewî ya gelê Kurd.

Dildar bi vê diyariyê ji gelê Kurd re navê xwe bi tîpin zêrîn di dîroka gelê xwe de nivîsand.

Lê mixabin temenê wî pir kin bû û di sî saliya xwe de,

di rewşen nenas de li  
(12/7/1948an) jiyana xwe ji  
destda, û bi goçbarkirina wî  
gelê Kurd rewşenbîr û  
kesayetyekî nirxbuha  
windakir.

Rêzdarî ji hemî Şehîdên  
Kurd û Kurdistanê re.

Ev e deqa sirûda Ey  
Reqîb:

### **Ey Reqîb\***

**Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman**  
**Naşkê û danayê bi topê zeman**  
    Kes nebêñ Kurd dimirin  
**Kurd jîn dibin**  
**Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan**  
**Lawê Kurd rabûye ser pêyan wek şêran**  
**Ta bi xwîn neqşîn bike tacî jiyan**  
    Kes nebêñ Kurd dimirin  
**Kurd jîn dibin**  
**Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan**  
**Em xortêñ mediya û keyxusrewin**  
**Dîn îman û ayîn îman Kurd û Kurdistan**  
    Kes nebêñ Kurd dimirin  
**Kurd jîn dibin**  
**Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan**  
**Em xortêñ rengê sor û şoreş in**  
**Seyr bike xwîna giyan me da rijan**  
    Kes nebêñ Kurd dimirin  
**Kurd jîn dibin**  
**Lawê Kurd tev hazir û amede ne**  
**Can fîdane can fîda her can fîda**

*Amadekar: Mistefa Henan*

## HEVPEYVÎN LIGEL MAMOSTE

Mamoste Salih Bozan di sala 1951ê de li gundê Şewitiyê girêdayî bajarokê Tel Ebyedê ye ji dayik bûye. Li Helebê dijî. Li Ukraniya (Yekîtiya Sovêta berê), di yûnîvîrsîta Kiyêvê de xwendina bilind bi dawî kiriye. Pileya Macistêr di warê “têkiliyên aborî yên navnetewî” de bi dest xistiye. Berhemên xwe yên ca’bûyî:



SALIH BOZAN

**\* Bi Kurdî:**

- 1.Lawo: Kurteçîrok( bi Kurdî), 2003an, Dihok.
- 2.Helbestêr Evînê li ser dergehêr heftan ên cihanê, helbestêr Ebdil Wehab Beyatî. Werger ji Erebî. Weşanxana Bajar. Istanbul 2004.

**\* Bi Erebî:**

1. نقد أفكار زعماء الردة في الفكر الماركسي. عن دار الطليعة عام 1994.
2. في الوجود، مجموعة شعرية. عن دار الطليعة عام 1996.
3. انهيار الاتحاد السوفييتي ومصير العالم الثالث. عن دار الطليعة عام 2002.

### *Pirs1- Wek nivîskarekî Kurd, beşê çêrokê daye ber xwe, tu di riya zimanê kurteçêrokê re dixwezî çi bibêjî û ustbarêr çêrokê çine ?*

Ne weke wîn dibêjin, ku min beşê çîrokê daye berxwe. Ez di nivîsên xwe yên kurdî de ne pirofesenâlim, min di jiyana xwe de ta niha pirtûkeke korteçîrokan derxistiye, û yeke din jî amade ye, lê ez di wergerê de jî dixebeitim, û di

ramanê siyasî û civakî de jî dinivîsim.

Bi nêrîna min kes nikare zimanê çîrokê bi sînor bike, ji ber ku bi nivîskar ve girêdayî ye. Gava nivîskar dixwaze di çîroka xwe de tiştekî ramyarî bi xwendevanan gihîne, ew bi zimanekî hêsane dinivîsîne,

weke Zekeriya Tamir, di pirtûka xwe ya bi navnîşana \* Tav \* de. Gava dixwaze piroblemên civakî bighîne xwendevanan, ew bi zimanekî rojaneyî weke zimanê Yosif Idrîs yê mesrî dinivîsîne, gava dixwaze bi efsanwerî nêrînên xwe bi xwendevanan gihîne, wê çaxê bi zimanekî remzî dinivîsîne. Lê nivîskar hene dixwazin di çîrokêن xwe de zimanekî hunerî nêzîkî

helbestê bafirînin, weke Selîm Berekat.

Li cem çîroknivîsên me Kurdan, zimanê Ferat Cewerî taybetmendiya xwe heye, û Helîm Yosiv jî nimûneyeke baş dide ber çavan.

Ez dibêjim zimanê çîrokê bi kultûra nivîskar, û bi pirojeya çîrêkêن wî ve girêdayî ye. Tu zimanê standart ji bo kurteçîrokê niîne.

### **Pirsa 2- Tu asta hunera nivîsandina kurteçêroka bi zimanê kurdî bi gelempêri û yêن nivîskarêن Kurdêن sûrî bi taybetî çawa dinrxînî ?**

**B**êguûman ên ku bi zimanê kurdî çîrokan dinivîsin gelek fêdenin, ji ber ku ew di rewşen dijwar de vî karî dikan. Ez du piroblaman li pêş wan dibînim. Piroblema **yekem** ziman e. Di vî warî de ciwanêن me xwe nawestînin, hema ku fêrî tîpêن latînî dibin, dest bi nivîsê dikan. Yanî bûyera çîrokê gor qelsiya zimanê wan xuya dibe. Piroblema **duyem**, di dest xortêن me de, tu kelepûreke çîroknivîsên

hêja tine ye, yanî çawa wê ev ciwan stîla zimanê çîrokê bizanibe, gava di dest xwe de vê nimûneyê nabîne.

Di nav Kurdêن Suriyê de, ên ku zimanî kurdî baş dizanin, ew di warê kultûr û hunera wêjeyî de lawaz in. Ên di warî kultûr û hûnera wêjeyî de zana ne, ji kultûra Erebî û ya cihanî gelek fêdekirine, ew di zimanê kurdî de ne pêşketîne. Lê dîsa ez karim bibêjim, ku Bekirê Şehînê Siwêrklî bi zimanê xwe û bi mijarêن

kurteçîrokêن xwe, bingehek ji kurteçîroka kurdî re daniye. Ebdil Helîm Yosif pirtûkeke xwe ya kurteçîrokan bi navnîşana \*Mirî ranazin\*, û yeke din bi navnîşana \*Jinêن Qatêن Bilind\* derxist. Di van çîrokêن wî de, em zimanekî kurdî yî hunerî dibînin, heta ez karim bibêjim ku ev çîrokina astêن xwe ne kêmî asta kurteçîrokêن Erebî ne.

Pîr Ristem di warê kurteçîrokê de ji Helîm Yosif kevintir e, û çend pirtûk derxistin. Zimanê wî baş e, ez karim bibêjim, di nav nivîskarêن kurdêن Suriyê de, ew bi zimanê xwe xurt e, lê

di warê hunera kurteçîrokê û ramanêن di paş çîrokê de ne ewiqas pêşketî ye.

Salih Demîcer, wî jî pirtûkeke xwe ya kurteçîrakan derxist, bi navnîşana \*Sozine ji Berfê\*. Di van çîrokan de nêzîkî jiyana mirovan ya rojane bûye, bi nêrîna min destpêka Salih Demîcer baş e, him di warê zimanê xwe de, û him jî di warê hunera kurteçîrokê de.

Bi kurtî ez dixwazim bibêjim, ku kurteçîroka me ya kurdî hîn ciyê xwe negirtiye, ne bi projeyên xwe, û ne jî bi zimanê xwe.

### ***Pirsa 3 - Tu çawa hînî zimanî kurdî bûye û pêwîstiya nivîsandina bi zimanê dê û bi tîpêن Latînî dibînî ?***

**T**a 1994an min ne zanibû bi zimanê kurdî ne bixwenda

û ne jî binivîsanda. Eynî ku min dixwast di vî warî de zanabim,

lê derfet ne diket destê min. Ji aliye kî din ve, ez ta pozê xwe di karê partiya komonîst ya Suriyê de fetisî bûm. Di vê

partiyê de tiştekî bi Kurdî tinebû( bêguûman ev mijareke dine). Ji aliye din ve, tu pirtûkên Kurdî wê çaxê neketin destê min. Di wê sala 1994an de, xarziyekî min carekê giramera Celadet Bedirxan ji min re anî "giramera zimanê kurdî-zarava kurmancî", ji ber ku wî dizanibû ez li tiştekî weha digerime.

Min sê mehan xwe da ber vê pirtûkê, û weke şagirtekî dibistanê xwend. Di vê demê de, ferhenga Goranî jî kete destê min. Gava min xwast êdina bi kurdî binivîsim, çend biroblem li ber min derketin. A yekem ci binivîsim, gava ez li helbestê fikirîm, min dît ku peyvîn kurdî di bîranînê min de na gihêjin asta ku ez aza bifikirin û binivîsim. Ez li gotaran fikirîm, lê min dît ku ez têrminên zanistî, siyasî, ramyarî, civakî, û aborî bi Kurdî nizanim. Herweha di warê çîrokê de jî bingeha zimên li cem min pir lawaz bû. Ji bo çareseriya piroblema

duyem bikim, ezê peyvîn kurdî ji ku bînim, peyvîn di ferhengan de mirovan fêrî sazkirina hevokan nakin, ew peyvîn rût in, û li pirtûkxaneyan tiştekî Kurdî tineye, ji ber ku ziman û kultûra kurdî li Sûriyê qedexeye. Piroblema sêyemîn a li pêş min derket, gava ez li nivîsa kurdî diramiyam, min siftehîn hevok bi Erebî saz dikirin, paşê werdigeran Kurdî. Eynî ku ez bi van nivîsên xwe kêfxweş bûm, lê herku piştî çend rojan, ez lê vedigeriyam, min tiştek ji wan nivîsên xwe fêm ne dikir.

Çawa min ev piromlemên xwe çareserkirin?.

Wê demê li taxa Aşrefiyê ya li bajarê Helebê, pirtûxaneya XANÎ hebû, min gelek pirtûkên bi zimanî kurdî ji vê pirtûkxanê kirîn. Pişt re min ji pirtûkxaneya CELADET?? ya mamuste Mihemed Hemûo jî çend pirtûkên din kirîn. Min "Mem û Zîn" baş xwend, û her heşt dîwanên Cîgerxwîn, û yên Meleyê Cizîrî. Antelojiyeke helbestên kurdî bi dest min ket, ez rind li ser sekinîm. Bi xwendina xwe re, min ferhengaka Erebî-Kurdî

çê dikir, û bi demê re ev ferhenga gelek mezin bû. Ez ta niha fêdê jê dikim. Bi rastî min gelek pirtûk û rojname debirkirin, û xwendin.

Tiştikî din jî zimanê minê Kurdî zengîn kir, ew jî kenala televizyonê ya MED-TV bû. Min li hemû pernameyên wê tamaše dikir, ji bo ez di her cureyên jiyanê de têrmên Kurdî bizanibim, û hemû peyvên nû min li cem xwe dinivîsandin.

Bi vî hawayî min herdu piromlemên siftehîn çareser kirin. Lê piroblama sêyem bendekî mezin bû li ber min, çawa ezê bi Kurdî bifikirim û binivîsim?.

Gava li Rûsayê, ez fêrî zimanê rûsî dibûm, mamosteya min ji min re digot, *kî çax tu gîhîştî asta ku bi rûsî bifikirî, wê çaxê tuyîê ji xwendinê baş fêmbikî û baş bi rûsî binivîsi.*

Min defterek kirî, û dest bi nivîsa ku ez karim bi Kurdî

bifikirim kir, yanî di jiyanâ xwe ya rojane de çi dikim, min ew dinivîsand. Sibê çi wext ji xew radibim, çawa diçim karê xwe, li karê xwe çi dikim, kê dibînim, çawa vedigerim mal, çi dixwim, êvarê diçim kuderê û cem kê, li ser çi mijaran bi hev re daxivîn. Lê mijara ez zû pêre hatim, gava min li ser zarokiya xwe, û bûyerên herêma xwe nivîsand. Di eynî demê de min nivîsa bi Erebî rawestand. Ev kara du salan li pê hev min berdewam kir û di van herdu salan de, min sê defter tijî kirin. Wê çaxê ez hest bûm, ku nivîsên min êdina yek tiştîn hêja tê de hene.

Ta niha, çar defterên weha li cem min in, û madeya pirtûka kurteçîrokên min ên siftehîn, ku di 2003an de li Dihokê çap bûye, min ji van defteran derxist. Û hîn ez karim gelek tiştîn tên xwendin ji wan defteran derxim.

#### **Pirs 4 - Tu çi cudatiyê di navbera belavkirina di Intirnêtê û kovaran de dibînî ?**

**I**ternêt bi xwe, şoreşekê mezin e di warê ragihandinê de, ew pêle sînorêni siyasiyên hemû dewletan dike û derbasî ber çavêni xwendevanan dibe. Weke em dizanin, Internêt encamek ji ancamêni golobalîzmê ye, tu hêzên herêmî nikarin bendar li ber dînin, ji ber ku golobalîzm, em bixwazin yan nexwazin, qonaxeke nûye, ji pêwistiyâ pêşvaçûna civaka ademîzadiyê derketiye. Loma di pêşerojê de wê rola Internêtê zêdetirîn kûr û berfreh bibe. Li welatêni ku dewlet li ser bingeha qedexê ava bûye, Internêt ji stemkaran hêzgartir e, hemû alavêni qedexê dişkîne, û pêrgîna gelêni ku bi netew û kultûr û zimanê xwe bindest in tê, dengêni wan gelan li cihanê belav dike.

Bêguûman kovaran di sedsala bistan de roleke mezin di kultûr, û ramana cihanî de lîstine. Li welatêni Ereban hinek kovaran wergerandin di civatê de ajotin, nimûne kovara El-Erebî (العربي), Cihana Zanînê (علم المعرفة) yêni ji Kuwêtê

derdiketin. Ramana Nûjen (الفكر المعاصر), Pêşeng (المهلاك) Hîv yêni li Misrê derdiketin. EL-Edîb (الأداب), El-Adab (الشعر), Rê (الطريق), Helbest (الشاعر), Ramana Erebî ya nûjen (الفكر العربي المعاصر) Pêşeroja Erebî (المستقبل العربي), Ramana Erebî (الفكر العربي), yêni li Libnanê derdiketin. Zanîn (المعرفة), Pêşeng (الطبيعة) yêni li Suriyê derdiketin. Yekîtî (الوحدة) ya li Marokê derdiket??. Em di wê demê de li hember van kovaran bûn, me pir jê fêde dikir.

Kovarêni me yêni Kurdî li Sûriyê dereng derketin. Ku em Hawar û Gelawêjê yêni di sî û çelî de ji sed sala bîstan derketin dînin hêlekê, heta nodî ji sedsala borî qutbûneke fireh heye. Ji 1990î de li Sûriyê kovarna hêja derketin. Him bi zimanê Kurdî, û him jî bi zimanê Erebî. Dibe ku derengiya wan ji ber etmesfêra siyasiyû rewşa aborî ya partî û rewşenbîrêni Kurd, û kêmhebûna xwendevanêni bi zimanê kurdî be. Lê diîsa kovarêni wek Zanîn, Zevî, Gulîstan, Aso, Pirs, bi zimanê Kurdî, û bi zimanê Erebî, Rewşenbîrê

Pêşketî ، (المثقف التقديمي)  
Diyalog (الحوار) ، Zengilin(الأجراس) ، û Sorgul. Lê mixabin ev kovaran gîş sekinîn, bi tenê Pirs bi Kurdî ma, Diyalog, û Sorgul jî bi Erebî.

Ev hersê kovarana jî, ne di asteke bilind de ne, lê berdewam dikan. Weke em dizanin kovar di rewšeke ne demokrat de pêşnakeve. Ji bo kovarek pêşde here, û roleke kultûrî û rewşenbîrî û ramyarî bilize, pêwîste, kadroyekî xweyî rewşenbîr î

aste bilind hebe, têkiliyên xwe bi rewşenbîran re xurt be, di paş de sermiyanekî peran hebe, û bi teknelojiya nûjen derkeve. Ev tiştina gîşkî li cem Kurdên Sûriyê tinenin yan kêmîn, loma ez dibînim ku Internêt, pencera me ya girîng e ji bo em kultûr, wêje û ramanên xwe bi xwendevan gihînin, û bi hev re pêşda biçin. Lê weke em dizanin Internêt jî li Sûriyê ne di rewšeke demekrat de ye.

### ***Pirs 5 - Tu çawa li kovara pirs dinêrî û çi jê dixwazî û pêşxistina wê ustbariya kê ye ?***

Weke min berê jî got, hêjabûna kovara "Pirs" di berdewamiya wê de ye, Lê kovar bi xwe di aliyê berhemên tê de tênen weşandin lawaz e, xwendevanan rewşenbîr nake. Ez rewşa wê ya hundirîn nizanim, û ni zanim astengên li hember wê çine,

lê bi vî awayî ku derdikeve, ez malperên kurdî di Internetê de zêdetirîn balkêş dibînînin. Gereke rôdakterên kovarê li ber vê rastiyê bisekinin, ji bo kovar bibe ya hemû rewşenbîr û xwendevanên Kurd ên Suriyê. Ez vê daxwazê ji kovara "Pirs"ê di pêşerojê de hêvî dikim.

### ***Pirs 6 - Li dawiyê, tu dixwazî çi ji xwêneran re bêjî ?***

Ez dixwazim bibêjim ku rastiya me Kurdan di zimanê

me de ye. Di dîroka kurdî de, hêza ku ne hîst Kurd di gelên heremê de asimlasiyon bibin, berxwedana zimanê kurdî ye. Bira ciwanêن Kurd li vê rastiyê bi kûrbînî binêrin. Ya duyem, zimanê serbixwe ne bes elfebêye, ne bes axavtina devkî ye, ne bes kelepûra kilasîk e, ziman serbixwe ye, gava digihêje asta ku raman û kultûra nûjen karibe bafirîne. Ciwanêن me hema ku xwe fêrî elfebêya latînî dîkin, û çend berhemên kurdî dixwînin, berê xwe didin helbestê. Kesek di cihanê de nikare helbesteke hêja bafirîne, bê ku bi zimanê xwe ne xort be. Em Karin mînak Ehmed Huseynî bi ber çavêن

xwe din. Ew hîro ne bes di helbestê de afrandekar e, di alî zimanê xwe yî helbestê de zêdetirîn bedew e. Bi rastî ew Selîm Berkatê zimanê kurdî ye. Zimanzan Helbestên helbestvanêن mezin dixwînin ji bo taybetmendiya zimên fêm bikin, lê helbestvan nikare ji berhemên zimanzanan helbestê derxîne. Mebesta min ew e ku ciwanêن me yên Kurd gerek bêtir bi Kurdî bixwînin û hindik binivîsinin. Bi nêrîna min, ku ciwanêن me ji zimanêن biyanî berheman wergerînin Kurdî, wê fêdêyeke mezin him li xwe bikin, û him jî li ziman û kultûra Kurdî bikin.

**Pirs**

## Helbestvan û nivîskara Kurd

### Muruvet Cacim Kurtejiyana min

**EZ** LI 21 ê Adarê li sala 1966an li roja Newrozê ji dayîka xwe bû me. Bi eslê xwe ji Araratê me. Lê jiyana min piranî li Amedê (Diyarbakir) derbas bû, ji ber vê yekê, piranî însan min ji Amedê dihesibînin. Malbata bav û dîya min ji eşîra Etmankî ne. Bavê min Mele(îmam) bû. Ji ber vê yekê jî navê min navekî Erebî ye.

Min xwandina xwe li Qersê dest pê kir û li Wanê berdewam kir û hê xwendina min neqediyabû ez di 16 saliya xwe de zewicîm. 2 kur û keçeve min hene.

Berê ez di nav çepêن Tirkan de bûm. Bi ked û emekên xwe di nav partiyê de bilind bûm. Ez bûme endama rêexistina navendî, heyâ (polîtbîro) min cih girt. Demek hat ku ew partiya zivirî û bû dijminên Kurdan, min jî dest ji wê

partiyê berda. Paşê min di nav komîta rêvebir ya HEP û DEP de cih girt û kar kir, lê mixabin ewana jî ji ber nijadperestiya Tirkan hatin girtin... (di van deman de pir birayêن min hene wek İbrahim Incedursun, Musa Anter, Mehmet Sincar û pir hevalên din, ewana ji li aliyê dewlete ve hatin kuştin...).

Ez di sala 1.1 1989 da li Diyarbekirê hatim girtin, û li dawiya 1990î ji hepsê derketim, 2 meh şunde dîsa wê carê jî li Cizirê hatim girtin.

Li Diyarbekir pir caran di ser mala me de digirtin dixwastin min û hevalê min birevînin û bukujin, yên ku dihatin polîs û tîmêن teybet bûn û cara dawî jî ekîbek



hatibû û mirovek jî bi wan ra bû jê re digotin ‘reyis’, wana dixwast wê şevê me birevînîn. Min armanca wana fem kir û ez derketim pencerê û di balkonê de qêrîyam, lambên cîranan vêketin. Gel bi dengê me hişyar bû, polîsan li rewşa xwe û ya me nihêrin û bazdan di tariya şevê de wenda bûn.

Me mêze kir ku sitara me li Diyarbekirê nabe em çûne Stenbolê. Em gihiştin Stenbolê 6 roj şunde me bihist ku Vedat Aydin revandine û dure jî cesedê wî hate dîtin... Paşê di çapemeniyê de me wêneyên Mahmut Yildirim ku jêre digotin (Yeşil- Sakalî) dît û me ew nas kir. Yê ku nîvê şevê hatibû me birevîne û jêre digotin Reyis Yeşil bi xwe bû.

Paşê me nihêrî ku jiyana me li Stenbolê ji Diyarbekir xerabtir bû li Stenbolê jî hatim girtin û paşê hatim berdan, lê di mehkeman da hinek dewayêñ min jî hatin ber bi dawiyê ku ezê dîsa werim girtin, em jî mecbûr man û derketin Ewropa. Hatina min a Ewropa 29 rojan berdewam kir. Ez û zaroyêñ xwe ve ji Zagrebê heyâ Almanya

meşîyan. Di vê riyê de bi rojan me xwe vedîşart û bi şevan em dimeşîn. 6 roj mabû ku em bighîejin Almanya xwarin û vexwarina me nemabû û min gezoya ser daran (cilo) bi zarokan dida alastin ku taqetê zaroya hebe em bimeşin.

Em di çiyan de dimeşîyan ku navê wan çiyan Alp in, serma û seqema Alpa pir dijwar bû. Bi roj min xwe li erdê dirêj dikir û zarokê xwe li ser bedena xwe radizand ku erd şil bû, ji bo ku zarok nexweş nekevin... Ji ber vê yekê tendrustiya min xerab bû, ez demeke dirêj him ji ber êşkenceyan û hem jî ji ber vê yekê tedawiyê dibînim...

Ez 1980î û virde helbestan û kurteçîrokan dinivisînim. Ji 1990î û virde bi rewşeke profesyonel dinivisînim. Nivîsên min di Yeni Ülke Özür Politika û 1995an virde jî di kovara Güney de (Güney Dergisi) hinek caran ji riya internetê li hinek malperan û kovaran xwendevanêñ zanîngeha Essenê de hate çapkiran. Hinek caran jî gotaran dinivisînim. Nivîsên min di kovara Güney de berdewam in. Naha hêji li

Almanyayê me. Benda Bi rêz û slawên germ  
zivirandina welatê xwe me. **Mürüvet Y. Cacim**

## XERÎBÎ


Li dinyayê em in xemgîn  
Me winda kir wenatekî rengîn  
Ji bo me heps û zîndan  
Tu ferq nake welatê evdan.  
Li ber sefera van kafira  
Me bîrva kiriye rûçikê xwîşk û bira  
Dê û zarok ji hev qetandin  
Êdî sebra me teqandin.  
Dil û cergêن me kirin xwîn  
Li benda me be welatê zêrîn  
Her tim di dilê me de ye ev evîn  
Şev û roj her em in xemgîn.  
Dikim xem û xeyala te  
Bi fersehan ji min dûr î  
Nayêm cejn û sersala te  
Birîna dilê min de ya herî kûr î.  
Bi koletî û bi êsîrî  
Van helbestan ez dibêjim  
Li ser sêla agir im  
Can û cergêن xwe dipêjim.

**9.7.1996 Almanya**

**Mürüvet Cacim**

## Ger Hêv Tenê Li Esuman Lempak Ba

**L**î Alimaniya, di  
heyva huzêranê de,  
hunerwend Yosêf  
Beir Elbomek ji  
wêneyên xwe bi  
navnîşana " Ger hêv  
tenê li esuman  
lembak ba"bi zimanê  
Almanî çap û  
belavkir. Elbom ji / 81/  
rûpelan e, jê /1000/ çapkir.  
Bêtirî /85/ tebloyên têvel têde  
hene. Di wan tebloyan de diyar  
e, ku hunerwend Yosêf Berkir  
dîlbazê rengan e. Hestêن  
netewî û mirovatî, evîn û welat,



xwazeya  
Kurdistanê, nemaze  
çiyayê Kurmênc( Efrîn, Reco, geliyê  
tîran...) gelekî têde  
berzin. Li kêleka  
wan hestan, xem, êş  
û hêviyên gelê xwe  
(Helebice, Qamişlo,  
Newroz, Mem û Zîn, govend û  
dîlan... ) diyarin.

Mamostê hêja Husê.M.  
Hebeş, bi zimanê dê û van  
peyvan Elbom pêşkêş kir:

### DÎLBAZÊ RENGAN

**E**ger ku yek li tabloyên Bekir binêre, bê gûman wê têde  
afrandineke pir bi taybet bibêne, dê wê yekê bi xwe jî bihêle ku  
bipirse ew taybetiya wî ji kû û ji ci hatiye ? Yosêf mirovekî di nav  
rengan de xebatkar e, bi cefa, bê vehes, û bê gazind dixebite, bi dil,  
giyan, hiş û gewdê xwe rengan hembêz dike, û weke evîndarekî  
dîlbaز, pê re dikeve diyelog û danstandinê û pêwendiyek vekirî  
...pir xweşik û rengîn .Mirov dikare hest bike ku çewa reng ji  
kûraniya hest û evîna wî dadirivin, û çewa di nav tiliyên wî de  
zîrek dibin, û ew reng bi xwe çewa bi alikariya tiliyên wî weke  
sîmfoniyeke lihevhatî bi hermoniyek pir bilind li ser rûyê  
tabloyan şax didin, û çewa çavên bîneran di pêşengehan de  
matmayî dihêlin û herweha çêjeke nû di hinavan de kûr dicing.

Bekir dizane reng çiye û ew ji renga bi xwe ci dixwaze û bi ci awayî  
rihê wan rengan bi tiliyên wî saz dibin..Tu yê hest bikî ku, ka çewa di  
tabloya wê de rengê sor maçî yê kesk dike û yê kesk çewa bi rengê zer  
re dipeyive û tevahiya rengan çewa dîlana êş û şahiya wî bi şêweyekî  
azad û pir rewan ..Di asoyaek bê dawî de sirûdêن xwe diafirênin.

Hêjayî gotnê ye ku ez bibêjim Bekir ,yek ji wan evîndar û canbazên  
rengan yên pir balkêş in.

**Amadekar: M. Bekir**

# Merovê Nemir

## Amadekar: Memê Alan

**B**erî hertiştî, divê em têbigihên, ku tore û çanda Kurdî ne jixweberê gihaye vê radeyê ji dewlemendbûnê. Belê, ew bi cefayê gelek gernasên bi nav û deng, ên ku jiyana xwe di vê riyê de dane, hatiye holê.

Hin kesên hêja mîna Ehmedê Xanî, Meleyê Cezîrî, Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran ... hwd, ku pir li ser wan hatiye nivîsandin, xebat û jiyana wan hatiye naskirin, ronahî dîtine, berhemên wan hatine xwendin û gelek lêkolîn jî li derbarê wan çê nebûne.

Lê, gelekên din jî hene, mîna Melayê Bateyî, Mensûrê Girgaşî, Mîna, Macin, Sadiq, Pertew Beg, Bekir Begê Erzî, Şêx Nûredînê Birîvkanî ... û hwd, hindik li ser wan hatiye nivîsandin, an jî di sersiyê de mane. Wê yekê hîştiye, ku hinek ji wan hindayî bin, hinek jî ta niha ne nas bin û hinek jî aniha dixwazin toza demê ji ser vedin.

Wêlomê jî dema ku min pirtûka /Şâîrên Klasîk ên Kurd, a Abdulreqîb Yûsêf, ji wergerandina Elî Şêr, weşana Jîna Nû/ xwend, min dît pêwîst e, ku ez carê yekî ji van helbestvanênen nenas bi xwendevanênen Kovara Pirsê bidim naskirin û hinde perçeyênen bijarte ji berhemên wan li dû danasîna wan dînim. Helbestvanê vê carê jî dê Melayê Bateyî be.

## Melayê Bateyî

Melayê Bateyî helbestvanekî Kurd û bi nav û deng e, navê wî yê resen Husêن e. Ji niştecihênd gundê Batê ye, ku nêzîkî

geliyê Teyarê yê Hekarî ye. Ta niha ne xuya ye, ku Batî kurê kê ye, li kû xwendiye. Lê ne dûr e, ku wî xwendina xwe li Muksê, li dibistana Mîr Hesenê Welî kuta kiribe. Ji ber ku, ev dibistan yek ji navendên wê demê yên fêrkirinê yên mezin bû (dora 300 Feqe têde dixwedin û 10 Seydan jî tê de karê fêrkirinê dikir). Dibêjin jî helbestvanê me, li ba xwediyê dibistanê gelek bi qedir bû, û salê carekê rôdikir pê wî, ev yeka han di vê helbesta wî de diyar dibe:

*Li Çiryâ Paşiyê de Melayê Bateyî kanê Seferkêşa bi  
Muksê da, li ser weqtê zivistanê*

Ne dûr e jî, ku helbestvanê me li Cizîra Botanê û li Çolemêrgê jî xwendibe. Ji ber ku, wê hîngê, Çolemêrg wekî paytexta herêma Hekariyê bûye, û ta Wan û Muks jî bi ser ve bûye.

Li derbarê Bateyî, dîroknivîsê mezin Emîn Zekî di Tarîxa Kurd û Kurdistanê, di rûpela 336an de weha dibêje: Bateyî di navbera salên (820-900î)g/ (1415-1495an)z. de jiyaye. Herweha mamoste Eladîn Sicadî di pirtûka /Mêjûyî Edebî Kurdi, rûpel 536/ de, çêra wî kiriye, lê li derbarê jiyana wî tiştek negotiye, lê rêzdar Ebdilreqîb Yûsêf dibêje, ku ev dîrok gelekî dûr e, û baweriya wî ew e, ku Bateyî di navbera çerxa 11 û 12an.g. de ye, û ew ji dema Ehmedê Xanî ye. Ji ber ku, eger Bateyî berî Ehmedê Xanî ba, belkî Ehmedê Xanî, M.Cezîrî, Feqeyê Teyran û E.Herîrî, dê çêre wî bikirana.

Cardin xuya dibe ku, Melayê Bateyî wê hîngê gelek bi nav û deng bû û helbestên wî di nav xelkê de belavkirî bûn. Herweha helbesta wî ya bi nav û deng “Subh û Îvarê” di temenê xwe yê (50)î de gotiye. Di vê helbestê de weha dibêje:

*Pêncî Salê Şehlewendî Keftime Çaha resed*

Ebdilreqîb Yûsêf dibêje, baweriya min ew e, ku berî Batî bibe helbestvan, Ehmedê Xanî jiyana xwe ji dest ye, û piştî

Batî xwendina xwe tewaw dike, ew dibe seyda û karê fêrkirinê dike.

M.Bateyî jiyana xwe di fêrkirin, zanist, tore û helbestristûnê de berbas dike û bi wan binavûdeng dibe. Dibêjin, M.Batî çûye Hecê jî, û helbesta xwe ya bi navê “Hilo rabe Ebûl Qasim” li ser gora pêxember nivîsiye:

*Hilo rabe Ebûl Qasim hulo ey qasidê ekber*

*Hilo fexra Benî Haşim hulo rabe tu yî rehber*

Xuyaye ku Bateyî, gelek helbest ristine û pileya wî di helbesthûnandinê de zor bilinde, lê mixabin helbestên wî nehatine komkirin, lê eger ku mirovek wê bi karî xwe ke, li kurdistanê bigere û helbestên wî ji vir û ji wir kombike, wê karibe dîwanekê ji wan helbestan amade bike.

Bateyî, bi navê Mewlûda Kurmancî mewlûdnameyek jî daniye. Ew di nav xelkê de gelek belavbûyî ye. Pêşıya wê weha ye:

*Hemdê bê hed bû Xudayê alemin*

*Ew Xudayê daye me dînê mûbîn*

Ew mewlûdnama gelekî xweş û rewan e û bi zimanê Kurdî ye. Û di sala 1324an.g. de li Misirê hatiye çapkirin. Bateyî di warê eşq, evîn û welatperweriyê de jî gelek helbest hûnandine, yek jî wan eva li jêr e:

*El wefayê weslê canan xemz û naza min nehat*

*Ya tu qelbê aşiqan î gul nîgara min nehat*

*Mam bi qeyda derd û daxan xemkusara min nehat*

*Sibhe nabit wê şevê dengê minara min nehat*

*Derd û dax im bê qerar im bê buhar im bê çîmen*

*Bê hebîb im bê tebîb im hem xerîb im bê weten*

*Şubhê Ye'qûbî ji eşqa Yûsuftî gul pîrehen*

*Munisê derd û xeman im sakinê beytul hezen*

*Tar û mar im intîzar im şehsuwara min nehat*

\* \* \*

*Pertewa sen'd cemalê min disojit dem bi dem*

*Îştiyaqa zulfû xalan têk kirim deryayê xem*

*Dame ber pêça fîraqê weslê qet nukit kerem*

*Ma mededkarê mebit “înna fetehna” sibh û dem*

*Werne sotim ateşe dil şehriyara min nehat*

\* \* \*

*Şubhê mestan im wekû dîwane ez diwan ne ser*

*Badenoş im purxuroş im bêyî huş im derbeder*

*Hesret û hicrîn keser mehbûb û xîrin bîl-nezer*

*Bîl fîraqî lîl telaq bê sikûn im ta seher*

*Xo leb nuşîn ba ezîz im diligara min nehat*

\* \* \*

*Meclîsa bê saz u hey hey min nevêt naçime yê*

*Bê defû bê çeng û bê ney min nevêt naçime yê*

*Bezmeya bê yarê Batey min nevêt niçime yê*

*Bê feraxet yarê Butê işwegada min nehat*

\* \* \* \* \*

Ev jî çend malik ji helbesta Zembîlhiroş:(<sup>1</sup>)

*Ey dil werin dîsan bicoş*

*Carek ji caran mey binûş*

*Bikin qiseta zembîlfîroş*

*Da she bikin hikayetê*

*Zembîlfîroş lawkê rewal bû*

*Bi kîlîfet û ehl û eyal bû*

*Husnekî usifli bal bû*

*Heq rizaqê qismetê*

**Merwan Berekat**

**Z**i gundekî ji gundên Çiyayê Lêlûn, ku li başûr û rojhilatî bajarê Efrînê dikeve, jineka jinebî û keça xwe ya çardesalî, talejiyana xwe bi kefecanî diborandin.

Roja wan westandin û karê zor bû, şevêwan ax û of û keserên jiyanê bûn, rewşa wan, her ji derd û kulan bi dax bû.

Yanê jiyanâ wan wek kirâse ku ji perspanan cihê nîv perspanekî lê nemabû, deriyê dema wan bi kilât êşan di bêdengiyê de dihate girtin, û bi nalînêwendabûna hêviyên jiyanê vedibû, lê tucarî di dilên wan de zengilên viyan û berxwedana jiyanê bêdeng nediman, û her li ber argûnkê rûmetiyê, şerê xinzeferlekê dikirin... carna çav bi rondik û pir caran jî dîlê awazên birçîbûnê bûn,

lê ew can zelalbûn wek cînciqa piyala "Mesîh" bûn.

Navê jinebiya perîşan Rewşen bû, û navê keça wê jî Gul bû.

Rewşen û keça xwe ve, ne barê demê bûn... Wêneyênen rojan di navkelên wan de dîlê viyana wan bûn, eger demê 'ewrên perîşaniyê di ser wan de berdidan, viyana wan jiyan dijeniya.

Rewşen û keça xwe ve dengên bilbilan baş guhdardikirin, ji ber her û her berî ku tîrêjên rojê eniyên çiyan ramûsandana ew hişyar dibûn.

Rojekê gundiye kî nîvxanedan riya xwe bi mala Rewşenê xist, ji bo binase ka çawa ew û keça xwe ve dem û jiyanâ xwe diborînin, û daku binhire ka tiştek bi wan divê yan na.

Piştî ku ew gundiye nîvxanedan ji serdana mala Rewşenê vege riya, ji perîşaniya wan navkeleka dilovaniyê dilê wî bir û anî, û xwîna comerdiyê xwe di tevaza rehêن wî de berda, bi dengekî sertawaz bane kurê xwe yê mezin kir û jêre got: Loooo... Cimo! Kurê min, here nav keriyê pêz û bizneka li ber zandinê ji Rewşena perîşan re bibe, bila doşaniya wan jî hebe, rewşa wê û keça wê kefecaniye, bi xwedê dilên gawirêن vê demê bi wan û rewşa wan dişewite.

Cimo kurê Remoyê nîvxanedan di nav keriyê pêz re geriya, her ku dikir destêن xwe bavêje bizinekê û wê bigre necomerdiya wî ew bi paşve vediçengand, lê carna wêneya Gula porçîl di ber çavêن wî re diçû û dihat, wê yekê hîşt ku destêن xwe bavêje guhêن bizna guhşîn, daku wê bibe mala dêya Gulê, lê ta Cimo bizin gihad mala Rewşenê, deh qurmîçekên wek cihê razana zovan?? di eniya wî de çêbûn, yanê eger bizin ne deh berî bûya belkî Cimo

ji mala Rewşenê li ser piyê çar camêran li dê û bavê xwe vege riya. Cimo bi hêvî bû ku li çûna mala rewşenê çavekî li bejna Gula porçîl xîne, lê wî nizanibû ku yên wek wî tucarî ne di bîr û bala Gulê de ne, ta Cimo li mala wan bû wê xwe di karêن derive de mijûl dikir.

Belê .. Ne her yek kane deriyê xwe li comerdiyê veke, lê yê ku hînî comerdiyê bibe her kilîtê deriyê mala wî şikestiye.

Rewşen bi diyariya nîvxanedanê gund pir dilşad dibû, hema te digot belkî keriye pezê koçeran jêre diyarî hatiye.

Rewşen û keça xwe li bizina guhşîn miqate dibûn, nanek dikirin sê par, û ji şabûnekan re carna Rewşenê şaş dikir û bi Gulê re digot guhşînê. Piştî çar, pênc rojan bizina guhşîn cêwiye karî guhfitîlî anî... Lê qedera perîşanan re şe, pend û şireta Kurdî dibêje (Dikir roj li sêwîyan hilata, heft caran malan ji gund barkirin ). Pêştî ku pênc

rojan Rewşenê bizina  
guhşîn dot, karên bizinê  
mirin, wek ku hatiye  
naskirin bixin pir bi şîrin, lê  
waqasê jî nazik in, piştî  
mirina zoyê karan bizina  
guhşîn jî mir.

Şîrê ku wan pênc rojan  
Rewşenê ji bixinê dotibû,  
ew li ser agirê şiv û darikan  
gerand û ew kire firo. Li  
berbanga roja çarsemê,  
Rewşenê biroşa firo daye  
ser serê xwe û berê xwe  
daye bazara bajarê Efrînê.

Piştî ku Rewşen ji nav  
gund derket, ew bi hêviyên  
xwe re mijûl dibû, xwe  
dilşad dikir û bi xwe re  
digot:

Ezê firoyê xwe bifroşim

Li bazarê...

Li nav bastan bigerim

Fîstanekî gulgulî...

Du berbiskên wênedilî...

Cotek guharî navikzengilî

Şeş zêrzendên xilxalî...

Solekê û desmaleka pûliklî

Kembereka zîvî....

Kildanekê û xizêmeka zêrî  
ji keça xwe Gulê re bikirim.

Belê... Li çarşema bê li  
gundê me dahol û zurne ye,  
daweta kurê Zelo ye, Gul wê  
xwe bide ber xemlê, Gul wê  
here govend û dîlanê, ewê  
bibe wek keskesora miha  
Adarê, her yekê bipirse li  
wê gewrê, ta dengbêj jî wê  
bidine strana "Lêlê Gulê  
gulbiharê". Di çavêن xortan  
de Gul dê bibe Zîn û Xeca  
Mamê, piştî dawetê bi sê  
rojan Çeko lawê Misto yê  
pir xwanedan, ewê dê û  
bavê xwe bişîne  
xwezginciya keça min Gulê,

Ezê doşekan li erdêxînim

Balgiyan li ser hev dînim

Xwazginciyyêن Gulê,

Li sîngê malê rûnînim.

Piştî silav û  
rewşpirskirinê, Misto bavê  
Çeko wê berê xwe bide min  
û bi min re bibêje: Diya  
Gulê, em hatine keça te Gulê  
ji Çeko re bixwazin, ma tu ci  
dibêjî, Rewşen bi xwe re  
dibêje, ezê cara yekê xwe  
giran bikim û bêjim na.  
Dema Rewşenê got na û

serê xwe bi şonde  
veçengand, biroş ji ser serê  
wê şemitî û ketxar,  
firo tev rijiya  
tizbiya hêviyan qetiya  
Tiştek ji Gulê re nekiriya  
Rewşen ji dil de giriya  
Destvala li mal vegeeria  
Girûzî hatinê wek diriya  
Rewşenê hêvî berdan, ji  
nûve viyana wê jeniya .

Piştî ku Rewşen destvala  
li mal vegeři, Gulê pirsa  
zûvegera wê kir, Rewşenê  
ev bersiv da : Keça min...  
Wek Bi diyariyên xelkê mal  
ava nabin, bi hêviyan jî, ne  
Gul dixemilin, ne jî dawet û  
dîlan çê dibin.

Belê keça min...

**Viyan ala jiyanê ye, û  
jiyana bi hêza viyanê  
berdewam bibe, ew rast  
jiyan e.**

## **Birûsk**

### **Ji Komîta Şevbuêrkên Kurdî re li Şamê re**

Xwişk û birayên hêja... Beşdarêñ birêz:

Bi bûneya 5 saliya dmezrandina Komîta we, **Komîta Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê**, bi navê Kovara PIRSê, em  
we pîroz dikin, û hêviya berdewamî û serkeftinê ji karê  
we re dikin.

Hêvî û dilxwaziya me ew e ku em hemî bi hev re ji bo  
geşkirina zimanê kurdî di civakê de kar û xebatê bikin û  
evîna xwendin û nivîsandina bi zimanê dê, zimanê me yê  
kurdî belav bikin.

Careke din em we pîroz dikin, hêvîdar in xebata we ya  
ji bo zimanê Kurdî her pêşve here.

Kovara **PIRSê** 24.07.2008 Z-2620 K

## **Qaziyê heqnas\***

### **Daneheva: Rezoyê Osê**

**H**ebû navdarek, hebû Paşak, axir hebû Mîrek. Mîrê me dibihîst ku li welatê wî, li bajarekî ji bajarên wî, Qazîkî heqnas heye, tiştek di ber re derbas nabe û li ser nameşe. Wilo jîr e, wilo zana ye, ku mü ji mast derdixe. Loma kesek li bajarê wî nikare ne fen, ne fût, ne jî teşqelan bike. Ci tiştê tê ber destên wî xweş ji hev derdixe û heq bi cih dike. Axir, heqbirekî bêhempa ye.

Rojekê Mîr xwest bi darî vî Qaziyê navdar û heqnas bikeve û bi çavên serê xwe rastiya heqbiriya wî bibîne. Bibîne bê çawa heqiyê dinase û dibire. Bo vê yekê û bo ku dilê xwe bixe cih de, êvarekê Mîr ji sayisê hespên xwe re got: “Îşev, hespê şînboz xweş êm bike û bi stêra sibehê re ji min re zîn bike, berê min li seferekê ye. Lê zanibe, ku nabe kesek ji sefera min hay be !”.

Bi zeraqa stêra sibehê re, Mîr çekêna başbazirganekî li bejna xwe kirin, li şînbozê xwe siwar bû û berê xwe da memleketa qaziyê navdar û heqnas, da bi çavên serê xwe birîna heqiya wî bibîne, da vê kulê ji dilê xwe derîne û xelateke hêja, yan jî cizakî giran, pê ve bigihîne.

Dûr, nêzîk, Mîr giha peravê bajarê Qazî. Li peravê bajêr yekî şeht, kop û seqet li ser devê rê dît. Dilê Mîr pê şewitî. Lê sekinî û berî jê bipirse, yê şeht ji siwarê şînbozê lava kir ku wî bi xwe re rake û bigihîne bajêr. Mîr, yek nekir didu, ew li pişt xwe siwar kir û berê xwe da sûka bajêr, cihê êzilamê, cihê tevreçûnk û kirîn û firotinê.

Gava gihan, lemelem bi sûkê ketibû, qîr û halan bû, çûn û hatin bû, lebt û tevger bû, axir bazareke giran bû. Mîr, di vê rewşê de, xwe ji bîr kir ku ne bi mîrîti hatiye

bajêr, ban'kir: "Xortino, werin vî kopê peya kin...". Belê, çend mirov, bi gaziya Mîr re, hatin da yê kop, ji ser pişta hespê, daxin. Lê, yê kop kire hawar û got: "Ne min daxin, wî daxin. Ev hespê min e, dixwaze, bi vî qilixê xwe, dest deyne ser hespê min, jê behwer nekin...!". Wilo, ew sûk li wan giha hev û bûne du bend. Bendek destên yê kop digre û wî heqdar dibîne, yek jî destên başbazirgan digre û wî heqdar dibîne. Axir, Mîr û yê kop birin ber destên Qazî, da ew heqiyâ wan bibire.

Ma Mîr li çi digere, wê bê serêşî xwe bigihîne Qaziyê navdar û heqnas, wê birîna heqiyê bi çavêr serê xwe bibîne û vê kulê ji ser dilê xwe rake û bifirîne. Loma bêdeng da pey wan û berê xwe bi wan re da Qazîxanê, cihê heqbirînê.

Gîhiştin Qazîxanê, dîtin va gelek li ber destê qêzî ne û heqiyâ wan dibire. Ew jî mane li benda dora xwe, mane li benda bextresî yan bextgewriya xwe. Lê, Mîr xwes guh dide heqîbirîna

Qazî, dide wê mereqa ku di ber de bûye rêuî û bi yekî kop re hatiye ber destên Qêzî.

Bi derbasbûna Qazîxanê re, Mîr dît ku Qazî du mirov xwestin. Herdu hatin û li ber masa wî rawestan. Yek bi ser û sîketên bajariyan bû, di dihnê xwendevanan de bû û rengalim bû. Yek jî bi cil û bergêr rêncberan pêçayî bû, bêpergal bû û ne gundî bû. Pîrekek jî bi wan re bû, bêdeng, sernexwîn û şermokî bû.

- 1 -

Qazî li çîroka wan pirsî. Yê rengalim got: "Ev pîreka min e...". Yê ne gundî jî got: "Ev pîreka min e...". Lê, Qazî bi wan re dirêj nekir, got: "Pîrekê bibin aliyê malê û hûn herdu sibe, vî çaxî, li min vegeerin. Sibieh tê xêr pê re". Pişt re, du mirovên din ber bi Qêzî ve herikîn û li ber destên wî rawestan. Yek jî wan tev tewaş bû. Te digot, qey hîzek rûn e. Yek jî tev bi xwîn bû. Te digot, qey niha pezek eyar kiriye. Yê bi tewaş got: "Ev kîsik yê min e

!” û destê xwe bi wî kîsikê devgirtî, yê li ser masa Qêzî ve kir. Lê, yê bi xwîn jî got: “Ev kîsik yê min e !” û destê xwe bi wî kîsikê devgirtî, yê li ser masa Qêzî ve kir. Lê, Qazî bi wan re jî dirêj nekir, got: “Kîsik li vir bihêlin û hûn herdu sibe, vî çaxî, li min vegezin. Sibieh tê xêr pê re”. Wilo, dora başbazirgan û yê kop hat. Ber bi Qazî ve herikîn, da heryekî tiştê li ba xwe bêje. Piştî Qazî li wan guhdarî kir, got: “Hesp bibin axwir û hûn herdu sibe, vî çaxî, li min vegezin. Sibieh tê xêr pê re”.

Sibeh hat û Qazîxane, ji yên bi guneh û bêguneh, hate dagirtin. Qazî serê xwe rakir û berê xwe da wî mirovê rengalim û got: “Raje destê jina xwe û ber bi oxir bibe!”. Û berê xwe da berdevkên qazîxanê û got: “Vî mirovî bibin girtîgehê, da bicirihe xwe!”. Wilo, yê rengalim û jinikê destê hev girtin û derketin. Yê ne gundî jî birin girtîgehê.

Dor hate ser yê bi tewas û yê bi xwîn. Qazî berê xwe da yê bi xwîn û got: “Were raje kîsikê xwe û ber bi oxir

bibe!”. Û berê xwe da berdevkên qazîxanê û got: “Vî mirovî bibin girtîgehê, da bicirihe xwe!”. Wilo, yê bi xwîn rahişte kîsikê ser masa Qêzî û ber bi oxir bû. Yê bi tewas jî birin girtîgehê.

Bi vî rengî dor hate ser yê başbazirgan û yê kop. Hinga Qazî ji pişt masa xwe rabû, herdu raçengî xwe kirin û berê wan da êxwir, da koxa hespan û ji wan re, başqe başqe, got: “Hespê xwe, di nav vî selefê hespan de, binase. Başbazirgan destê xwe bi hespê xwe ve kir û got: “Ev e hespê min”. Gava bû dora yê kop, wî jî destê xwe bi hespê ve kir û got: “Ev e hespê min”. Bi kurtî, herduwan hesp nasîn.

Wilo, li qazîxanê vegezan. Qazî berê xwe da başbazirgan û got: “Here raje reşma hespê xwe û ber bi oxir bibe!”. Û berê xwe da berdevkên qazîxanê û got: “Vî mirovî bibin girtîgehê, da bicirihe xwe!”. Wilo, başbazirgan çû koxê, rahişte reşma hespê xwe û bi rê ket. Yê kop jî birin girtîgehê.

Dibêjin, Mîr bêtir kete xulobatan, qebiçî û nama zanîbû ti rê ji vê yekê re bibîne. Loma, berê xwe da mala Qêzî, da vê kulê ji ser dilê xwe rake, da ji devê Qazî bibihîze çawa û çilo heqiyê dibire, da zanibe çawa wî xelat bike, yan jî ciza bike. Wilo, gihişte ber dergehê mala Qêzî û, piştî destûrpêdanê, derbasî hundir ba Qazî bû. Ne kin kir, ne dirêj kir. Pirsa xwe rût û ziwa li nav çavên Qêzî da, got: "Ezbenî, ez hatime binasim, te çawa ev heqî birî. Çima te jinik da wî mirovê bi qilix û yê kerax rîkire girtîgehê, te kîsik da mirovê bi xwîn û te yê bi tewaş rîkire girtîgehê, te hesp da min û yê kop rîkire girtîgehê?!".

Qazî, ne sor bû, ne reş bû, ne tirsiha û ne fedî kir, lê vegerand: "Başbazirgan, tu mirovekî xerîb î, dunyadîtî yî û ne ji xelkên vî bajarî yî. Serê xwe bi vê heqîbirînê ne êşîne û ji xwe re neke kul û bi xwe re nehilîne. Heke heqê te ne gihaye te û tiştekî te bi min re mabe bêje, xwe ne êşîne?!".

Axir, piştî dan û standinê, Qazî heqîbirina xwe, ji başbazirgan re zelal kir û pê da nasîn, got: "Başbazirgan, gava min jinik rîkire aliyê malê, ne ji ber ku pirsan jê bikim, lê min xwest ez lepta wê binasim, ne guhêñ xwe bidim gotinêñ herdu mirovêñ pê re. Wilo, min sibehê gazî wê kir ku masa min paqij bike. Belê, jinik bêdeng rabû, mase paqij kir, hûremûrêñ li ser nijinandin û duwêta min dagirt ximav. Min hinga nasî, ku ev jin berê bi vî karî rabûye û li ser xwe xerîb nabîne. Dimîne ku jina yê rengalim be, ne jina yekî gundi û kerax be. Ma ne wilo ye?".

"Lê, çîroka yê bi tewaş û yê bi xwîn hesantir bû. Min ew kîsikê tije zêr bi xwe re bire malê. Min ew zêr valayî nav zerikek av kirin. Min sibehê li ava zerikê meyzand, min ti tewaş li ser avê nedît. Wilo, min naskir ku ev zêr ne yên destêñ tewaşfiroş in. Wilo, min kîsik da yê bi xwîn. Ma ne wilo ye?".

“Dimîne çîroka te û yê kop. Çîroka we girantir bû, loma min hûn birin êxwir, ne ku hûn hespê binasin, lê ka hesp we dinase yan na. Gava te got, ev e hespê min, rast te ew naskir. Lê hesp jî guhêñ xwe bi ser te de pêl kirin û bi hêvî li te meyzand. Wilo, yê kop jî hesp nas kir û yekser destnîşan kir. Lê, gava hesp çav pê ket, guhêñ xwe çeqel dane paş û jê ma bi hesab. Wilo, min nasî ku hesp, hespê te ye, ne hespê yê kop e. Ma ne wilo ye?”.  
.

Başbazirgan, bi van gotinan re, xwe bi Qazî da naskirin û salfa hatina xwe jê re berçav kir. Lê, Qazî got: “Mîrê min, hatina te, ji min re, xelata herî mezin e. Lê, ku cizakirin di serê te de hebe, ez li ber destêñ te me...”.

Wilo Mîr, bi heqbirîna Qazî, şâ bû û xelatkirina wî xiste bala xwe. Loma jê xwest ku nêzîk, bi seredanekê, bighe dîwanxaneyî Mîr

\* - *Min ev çîrok li havîna sala 1967an ji devê softî Brahimê Çebî, ji gundê Xirab Esker,bihîstiye. Lê, ev çîrok bi vî terzî (li gel hin cudahiyan) Lîv Tolstoy nivîsiye û ew sipartîye Emîrekî Cezayirî, bi navê, Boxos.*

# Cenga zeriyê

**Mehmûdê Sebrî**

Awir ji te ez kirme şiyar  
Dil jê lerizî bûye hejar  
Gava te şikand çav û biro  
Cenga te li dil bûye diyar  
Bejna te dema xweş tewizî  
Kil bû ji binî nay û çinar  
Hawîr me cîhan tev lerizî  
Rexter çi dizanî ji te, yar!  
Êrîşkir can vê re evîn,  
Rê nîne bikim qîr û hewar  
Exterme te hişt dil ji kulan  
Pir bûne nema têne jimar  
Cenga te dema gûr be li dil  
Namîne penah goh û zinar  
Bê top û tiving dil kire dîl  
Cenga zeriyê maye li dar  
Daxek li dil û can û ceger  
Derdê me ji yek bûne hezar

Daxa ku hinav jê qijilî,  
Dijwar e, xwedî nabe xewar  
Ez mame bi zarîn û keser  
Xew nakeve çav, nine temar  
Deryaye binî nine evîn  
Pêl har e ji min dûre kenar  
Bager li me fîzîne bi kîn  
Sergeşte, me xwîna xwe vexwar  
Çendî ku evîn gewze li dil  
Dijwarî û zor lê ne du car  
Ê ku ji cihan derkeve, bê  
Vîn û evîn bûye mirar  
Ê dilbijiy û zikperesî  
Amac be, ji jîn, bûye dewar  
Jîna ku evîn tê de nebî  
Bê hêviy û valaye kewar  
Ez dê çi bikim yar i'nirî  
No maye li xeyda xwe siwar  
Bê hûde ne tev şîret û pend  
Şorind ji mela şîx û qewar  
Payiz çi dirêj bûye li dil

Jîna me tu car nabe bihar  
Yar, zor e tu rûtîrş be li min  
Dêmgeş be, bi şewq, çeşne hinar  
Çerxê vegeŕîn, da bi evîn,  
Riswa bike dixsok û neyar  
Her geşke bi ken lêv û devan  
Da xunçe vebin bib'ne diyar  
Da qurnefil û misk veweşin  
Da qend ji lebêñ pembe, bibar.

---



## SERPÊHATIYEK

Danehev: M.Qere Hesen

**L**i Çiyayê Kurmênc, li gundekî ji devera Xastiya, xortekî ciwan mir. Û ji ber ku xortekî baş bû û hîn ciwan jî bû, dost, heval, merov, şeniyê gund û gelek xelk li mala bavê wî civiyan. Dengê girî digihîst derveyî gund. Hinan ji şenî çav li tabûtê diket û rabûn hildan ser milên xwe û bi dengekî bilind selewat kişandin û digotin: Pêxemberê selawet, Mihemed Mistefa selawet... Û herwiha xort diketin bin tabûtê û cîhê xwe diguhêrîn ber ve goristana gund dimeşîn û şenî li pê wan rêz Fatihe ji giyanê wî re dixwendin, û wilo ta gihêstin ser mezel û tabût danîn. Xoce li ber tabûtê sekinî, bawermend jî li paş wî sekinîn û bi ser tabûtê de

nimêj kirin. Pişt re, tabût birin li ber devê gora ku amade bibû danîn. Lê dema ku devê tabûtê vekirin, ew ci bibînin?! Dîtin ku tabût vala ye. Xelkê li wir hemî şêt mêt man, gelo ew laşe kû ve çû? Lê Xoce bi dengekî bilind got: Birano.. Vî ciwanî di jiyana xwe de tu guneh nekirine, ew mîna fîrişa/melaîka ye. Ew pakrewan e, ji tabûtê derkt û firî. Xelkê jî, hinan bawer kirin û hinan bawer nekir. Yê bawer kirin û bawer nekirin jî, di çala sêtiyê wer dibûn û herwiha şenî ji ser merzel belav dibû. Xwediyên mirî jî vegevîn, lê gava gihêstin mala xwe, dîtin ku laşê miriyê wan li hundir di nav nivînê de ye û têgihêstin ku tabûta vala biri bûn goristanê.

## Zimanê kurdî li cîhanê di rêza 31-an de ye

**PUKmedia/2008-05-13:** Yek ji kovarên navdar ên li ser zimên ku li Fransayê weşana xwe dike "Le Français Dans Le Monde", lîsteya "Zimanên herî bi bandor û dewlemend ên cîhanê" weşand.

Li gor lêkolîna kovarê ku di hejmara wê ya 335an de hatiye weşandin, **kurdî li gel hemû qedexekirinan jî, di nav bi hezaran ziman de, di rêza 31ê de cî digire.**

Li derbarî krîterên/pîvanên kovarê yên "zimanê bi bandor û dewlemend" jî, dema ku mirov zext û zorêni li ser zimanê kurdî li ber çavan bigire, ew krîter gelek giran in.

Krîterên bingehîn ên kovarê ev in:

*1.Hejmara mirovên ku wî zimanî bikar tînin. 2.Rêzdariya wî ya li internetê. 3.Hejmara welatên ku zimanê lê fermî ye. 4.Hejmara wergerên ku hatine kirin. 5.Film, mûzîk û pirtûkên ku bi vî zimanî hatine çêkirin û weşandin. 6.Pirtûkên rêzmanî û xebatêni li ser ziman.*

Di encama xebata kovarê de ku li gor 5 krîteran kiriye hat diyarkirin ku îngilizî zimanê herî bi bandor ê cîhanê ye. Li gel mîrata çandî ya zimanên rojavayî û komkirinê wan ên wêje û hunerî yên nivîskî yên dîrokî jî, kurdî di lîsteyê de ciyekî rêzdar girt. Kurdî di nav bi hezaran ziman de gelek ziman li dû xwe hiştîye, û herwiha di nav zimanên rojavayî de jî hin ziman li dû xwe hiştin.

Tiştê balkêş ew e, Zimanê Tirkî ku 730 sal e fermî ye, bi tenê 6 pileyan li pêş kurdî cî girt.

Û zimanê Kurdî ket pêşıya Farisî. Li gor rêza lîsteya wê kovarê, Farisî li dû kurdî tê.

Di lîsteya kovarê de, 10 zimanên herî bi bandor ên cîhanê ev in:

**1. Îngilizî. 2. Fransizî. 3. Îspanyolî. 4. Almanî. 5. Japonî.  
6. Flamanî. 7. Erebî. 8. Swêdî. 9. Îtalianî. 10. Danîmarkî.**

Çavkanî: ANF /mfa -Amîda Kurd

## **Ez bawer dikim:** **Du bêjeyên Kurdî!?**

### **1. Sarê' شارع :**

Ez bawer dikim, koka vê gotinê Kurdê ye û ji du bêjeyan pêk hatiye; Ji "Şar" bi wateya "bajar", û "Rê", û wilo bêjeyeke nû: "Şar-Rê, Şarrê, Şarê" ava bûye, û bi wateya "rêka nava bajêr/şar" bikar tê. Lê gava ku di Erebî de bikar hatiye, tîpa ئى bi dawiya wê ketiye, ev rewş jî tiştekî normal e di zimanê Erebî de. Ya ku hîn vê baweriyê xurtir dike, ew e, ku kesandina bêjeya "şarê" di zimanê Erebî de tuneye, yanê ew netê veguhastin û ew di nivîsarên Erebî yê demên berî Îslamî de jî bikar nehatiye, ew bêje piştî dema Îslamî hatiye bikaranîn û roja îro wek bêjeyeke Erebî ya resen tê nasîn. Kurd jî, roja îro bêjene din ji bo nasandina "şarê" bikar tînin, wek: Kolan, şeqam û hwd.

### **2. Qurban:**

Ez bawer dikim, ev bêjeyeke hevdudanî ye ji du bêjeyan pê

k hatiye; "Qur û Ban". Wekî ku em dizanin bêjeya "Qur yan jî Qir" ji jêdera Kurdî "qirkirin" a bi wateya "mirin, tunekirin.." hatiye. Ban jî: Gotineke Kurdî ye, wateya "jor, bilind" dide, jixwe Xwedê jî di nav ewên ku li "banî" ne. Wilo gava ku ew herdu bêje pev dikevin, bêjeyeke nû bi şêwuya "Qurban, Qirban" dafire û wateya "mirina ji banî re - ji bo banî" bikar tê. Bêjeya Qurban mebest û wateyeke olî standiye, ango tunekirin ji bo yên/yê li banî destnîşan dike, ji xwe Xwedê jî herdem li jor e, li banî ye, û dewar ji bo wî têن şerjêkirin/tunekirin/qirkirin û jê re dibin "Qirban".

**M.A.A**



**G**elek spas ji kovarê re, deriyê rûpelên xwe ji nêrînên têvel re vekirî, ku nivîskar û rewşebîrên bi zimanê dê dinvisînin, karibin nêrîn û têbînên xwe bibihnek zanistî ji hev re xuya bikin.

Piştî min nama mamoste Dilsozê Dozê xwend. Berî her tiştî spasiya mamostê berêz dikim, ku karibû li gor pêzanîna xwe nêrînan li ser gotara " nivîsandin "bida. Dixwazim li gor têbînên te nêrînên xwe xuya bikim û bibêjim: **Çiqaş mirov di zanînê de biçe; ewqas nezaniyê dinase.**

- Desteyê biryar nestandiye ku hin caran gotaran wek heye biweşînin, ez jî dengê xwe tev yê te dikim, gotarêne di asta belavkirinê de belav bibin, û desteyê rexine dikim ku ev li ber pişniyara endamekî hatî belavkirin, ne ji biryara desteyê hatiye.

- Rastiyek e her zimanekî hevoksazî û rastnivîsa xwe heye. Nivîskar pê raman, hest û nestên xwe derbirîn dike. Lê li kêleka wê jî her nivîskarekî şêweya nivîsandina xwe heye, ji ber ku, hevîrê wî weha hatî histran û parek e ji kesîtiya wî ya giyanî ye. Li vir divê nivîskar hajî xwe hebe awayê nivîsandina xwe li ser yên din ranexe û nebîne wek wî biramin, ger ne li gor şêweya nivîsandina wî be şas û çewt e.

- Ziman ji ferhengan mezin û firehtire. Pir bêje û gotin li deveyî ferhegan mane, û kêm bikarhatin û winda bûne, her mirovek parekê ji gotinêne wî zimanî werdigire, ciqas karibe

mêjiyê xwe jê mişt bike; ewqas wê jîr bibe û karibe nêrîn û ramanê xwe zelal bike û tiştê bixwîne dê zûtir têbigehe.

Ez piştgiriya nêrîna standarkirina nivîsandina zimanê Kurdî dikim û xwediyyê nêrîna bikaranîna hemî bêjeyên zimanê kurdî bi hemî zaravên xwe di nivîsandinê xwe bikartînim. Mamotê berêz Dilsozê Dozê tê li min pir biborîne, min nizanî bêjeyên di fehenga mêjiyê te de çine, ku wan bikar wînim.

- Wek em tev dizanin, rewşenbîrê Kurd yên bi zimanê dê dinivsînin, berî hînî zimanê xwe yê nivîskî bibe, hînî nivîskiya zimanê erebî, tirkî û farisî dibe. Bi riya van ziman rewşenbîrê kom dike, û ew zimana jê re dibe rodanek agahiyan têre werdigire û hukariya wan lê dibe. Pir bêje û têrm bûne cîhanî, bi kîjan zimanî bên nivîsandin wek xwe dimînin. Ji ber vê hin bêje weha di gotarê de hatine (Menewî, Mêşînî, Lîneyer, Endosî...). Ev netên wergerandin. Bi nêrîna min be, yê ku mijarekê wergerîne bibêje nim wergrandî. Bi navê xwe yê serat min mijarin wergerandin, nav û jêder xuya kirine.

- Zanîn wek ezmên bê dawiye, mirov ta mirinê hîn dibe. Divê ev rastî bêt pejrandin, têbîn û rexnan weke gulek bîn xwaş bi berguhê xwe re bike, destê xwe bavêje serê xwe kum li ser serî ye, lê na.

Li paşiyê ez hêvî dikim mamoste Dilsozê Dozê baş guhê xwe bi ser nêrîn û têbînê min de ku rast têbigehe û zav spas ji te û desteyê re.

Zamadarê Zindî